

# Grev di roja 38'emîn de ye


Hevseroka KCD'ê û parlamenter Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 38 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Birayê Ocalan, Mehmet Ocalan anî ziman ku çalakiya Leyla Guven girîng e û wiha got: "Divê ev bar li ser milê girtiyan neyê hiştin. Berxwedana gelê me ya li derve bikin, bêsînor e."

Koordînasyona KJK'ê daxuyaniyeke nivîskî da û berxwedana Leyla Guven a li dijî tecrîdê silav kir. KJK'ê da zanîn ku berxwedana Leyal Guven tirs berdaye dilê faşîzmê. Li Ewropayê grevên birçîbûnê dewam dikin. Di çarçoveya van çalakiyan de endamên Rêxistina Jinên Azad a Kurdistanê (RJAK) li navçeya Ranya ya Silêmaniyê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir."... *RÛPEL - 3*


e-rojname

15 Kanûn - Şemî 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 205


## Hesabpirsîna qetlîama Gurgumê



Em dikevin salevegereke din a nû ya qetlîama Gurgumê. Wek her salvegerê îsal jî dê kiryarên qetlîamê werin naletkirin. Bi vê yekê ev qetlîama ku di dîroka Kurdistanê de nayê jibîrkirin; careke din dê di bîr û hişan de zîndî bibe û ev yek jî dê were wateya vîn û helwestek da ku êdî qetlîam û qirkirin pêk neyên. Mîna 40 sal berê, dewleta mêtinger û qirker a TC'ê niha jî dev ji tunekirinê bernade... *Nivîsa Cûmalî Dogan* / *RÛPEL - 3*

# PENABER QETIL KIRIN

**Dewleta tirk kampa penaberan a Mexmûrê bi balafirên şer bombe kir û yek jê zarok 4 sivîl qetil kirin. NY û hêzên navneteweyî li dijî vê komkujiyê bêdeng in**

### LI MEXMÛRÊ SÛCÊ MIROVAHIYÊ

Dewleta tirk her tim bi xwedîderketina penaberên Sûriyeyê pesnê xwe dide û gelek caran li dijî dewletên Ewropayê penaberan wek şantajê bi kar tîne. Kampa penaberan a Mexmûrê bi balafirên şer ên dewleta tirk hat bombekirin û ji heman malbatê 4 kes hatin qetilkirin.

### JIN BE JÎ ZAROK BE JÎ...

Bi vê qetlîamê careke din rûyê rast ê dewleta tirk derket holê. Navê 4 kesên hatin qetilkirin wiha ne; Asya Elî Muhammed (73), Narinç Ferhan Qasim (26), Evîn Kawa Mehmud (14), Eylem Muhammed Emer (23). Kesên ku hatin qetilkirin bi merasîmeke girseyî hatin oxirkirin... *RÛPEL - 3*



### HDP'Ê ÊRÎŞ ŞERMEZAR KIR

## Bi bombekirinê propagandaya hilbijartinê



### Vîşêrê têkoşînî ti rayîr çin o

Hemserekê Pêroyî yê KESKÎ Mehmet Bozgeyîkî derheqê mîtîng de qisey kerd û va: "Vîşêrê têkoşînî ti rayîr çin o."... *RÛPEL - 5*



### Avşîna yew serrî nîna dermankerdiş

Hulya Usanmaze qezaya Artuklu ya Mêrdînî de bi îdîaya 'endamîya rêxistine' ameyêne muhakemekeriş... *RÛPEL - 5*

# Bendav teqiya Dîcle bilind bû



Ji ber baranê bi armanca hevsengiya ava zêde ya bendava Kiralkizi ya navçeya Gêl a Amedê 3 deriyên bendavê hatin vekirin û piştî demekê deriyek teqiya. Hat ragihandin ku çemê Dîcleyê 6 metreyan bilind bûye û welatiyên ku malên wan li dora çem in malên xwe terk kirin. Gelek baxçe jî di bin avê de man.

### ÎMO dê raporê amade bike

Hevserokê Şaxa Odeyên Endezyarên Înşaetê (ÎMO) yê Amedê Nihat Noyan, têkildarî teqîna çavê Bendava Dîcleyê axivî. Noyan, diyar kir ku piştî ew lêkolîn bikin dê rapor amade bikin û wiha got: "Gelek pirs li benda bersîvê ne."

### Jinên Reqqayê ji bo parastina ewlehiya bajarê xwe dixebitin

*Rûpel -2*



## Parlamenter Ebrû Gunay Rewşa girtiya nexweş bir meclisê

**ENQERE** - Parlamentera HDP'ê ya Mêrdînê Ebru Gunay bi armanca balê bikişîne ser girtiya nexweş Meles Tekîn a 80 salî pirsname da meclisê û xwest Wezîrê Dadê Abdulhamît Gul bibersivîne. Gunay anî ziman ku Tekîn temenê wê yê nasnameyê 73 ye lê bi fermî 80 salî ye û wiha got: "Meles Tekîn divê li Nexweşxaneya Lêkolînê ya Xerpêtê ji ziravê xwe bê emeliyatkirin. Lê ji ber temenê wê mezin e û girtî ye, emeliyat ji bo wê xeteriyek mezin e. Dîsa ji ber bi tirkî nizane nikare bi rayedar û bijîşkan re biaxive. Tevî hemû hewldanên malbat û parêzeran Tekîn sewqî girtîgeha Mêrdînê ku li bajarê wê ye nekirin. Ji bo Tekîn bê dermankirin, heta niha rayedarên girtîgehê daxwazên wê nebersivandine.

# Hebûna gelekî bi asta têkoşînê diyar dibe

**Jinên Efrînê yên li dijî tundiyê her tim serî hildidin û hevjînê wan di Berxwedana Serdemê de şehîd bûne, anîn ziman ku ew bi berxwedêrên azadiyê yên ku di oxira doza azadiya kurd de jiyana xwe dest dane, serbilind in û wiha gotin: "Hebûna gelekî bi asta têkoşîna wî gelî diyar dibe. Em ê jî ji bo hebûna xwe asta têkoşîna xwe bilind bikin."**

Di encama êrîşên dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê yên di 20'ê çileyê de li hemberî Efrînê dest pê kiribû, gelek kesan jiyana xwe ji dest da. Kesên ku li ber xwe dan û jiyana xwe ji dest dan li dû xwe bîranînek hiştin. Piştî êrîşan gelê Efrînê mecbûr mabû ku koçî Şehbayê bike. Gelek jinên ku koçî Şehbayê kirin hevjînê wan di berxwedana serdemê de jiyana xwe ji dest dan û bûn berxwedêrên dîrokê. Niha jinên ku hevjînên wan jiyana xwe ji dest dane tevî zarokên xwe ji bo parastina hebûna xwe têdikoşin. Hevjinên şehîdan diyar kirin ku hebûna gelekî bi asta têkoşîna wî gelî diyar dibe.

Selwa Mihemed a dayika 3 zarokan, diyar kir ku ew û her sê zarokên wê yên bi navê Heval, Ronahî û Rojbîn niha li Şehbayê têdikoşin û wiha got: "Em şopdarê berxwedêrên ku di Berxwedana Serdemê de jiyana xwe ji dest dane, ne. Ez bi şehadeta hevjînê xwe Loqman serbilind im. Loqman digot ez ji bo azadiya zarokên xwe şer dikim. Dê neyar tu carî



nikaribin ku me ji rastiya jiyana me û têkoşîna me dûr bixînin. Di heman demê de ez xwişka şehîdan im. Bila Erdogan baş bizanibe ku dê axa me bê rizgarkirin. Efrîn a me ye û dê serkeftin jî ya me be. Dê xeyalên neyaran ên qirêj têk biçin."

**Bi şehadeta hevjînê xwe serbilind e**

Jina bi navê Şervîn Reşîd a ku hevjînê wê Rifat di Berxwedana Serdemê de şehîd bû, anî imzan ku dagirkeran xwest bi tank û topan çavên gel bitirsînin û ev tişt vegot: "Lê ji bo azadiya xwe em ê her berdêlên giran bidin da ku neyar negihîjin armancên xwe. Em tu carî moralê xwe xera nakin û em ê li ser esasên felsefeya Rêberê xwe têkoşîna xwe bidomînin. Ez bi şehadeta hevjînê xwe yê ku di oxira doza azadiyê de şehîd ket, serbilind im."

**Ji bo rûmeta xwe şehîd bûn**

Dayika sê zarokan Besîme Yusuf a ku hevjînê wê jî di berxwedana serdemê de şehîd bû jî ev tişt anî ziman: "Hevjînê min ji bo rûmeta xwe şehîd ket. Li vir bi sedan zarok, xwişk, dayik û bavên şehîdan hene. Em hemû alîkariya hev dikin û ji hev re dibin moral. Şehîdên me sedema jiyana me ne."

Hevjîna berxwedêr Mihemed, Huriye Reşîd got ku li Efrînê dewleta tirk bi awayekî hovane êrîşî wan kiriye û wiha domand: "Lê em netirsiyan û heta dawiyê têkoşîna xwe domand. Jinan di berxwedana serdemê de têkoşînek mezin dan. Me carek din dît ku dagirker dê nikaribin îradeya me bişikînin. Em bi şehîdên xwe serbilind in û her şopdarê doza wan bin."

**'Hevjînê min zarokên xwe nedîtin'**

Hevjîna Berxwedêr Sîpan, Zelox Bila ku dayika du zarokan ne hêstên xwe wiha anî ziman: "Hevjînê min zarokên xwe nedît. Ronî û Nûrî niha bi hesreta bavê xwe dijîn. Lê çi dibe bila bibe em ê her şopa şehîdên xwe bişopînin. Felsefeya Rêberê me ji bo me rastiya jiyanê ye. Loma em ê li ser vê esasê têkoşîna xwe ya azadiyê tevî zarokên xwe bidomînin."

**'Me tu caran serî netewand'**

Her wiha hevjîna berxwedêr Menal, Fatma Hecî jî ev tişt vegot: "Me li dijî êrîşên neyaran û dagirkeran tu carî bejna xwe netewand. Her çiqas bi planên qirêj êrîş bikin jî em ê dev ji têkoşîna xwe bernedin. Hebûna gelekî bi asta têkoşîna wî gelî de diyar dibe. Em bi berxwedêrên azadiyê yên ku di oxira doza xwe de jiyana xwe ji dest dan serbilind in. Em ê ji bo hebûna xwe her asta têkoşîna xwe bilindtir bikin." *ŞEHBA*



## 'Vekirina lêpirsînan cureyekî êrîşa li ser jinan e'

Di çarçoveya çalakiyên 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya li Ser Jinê ya Cîhan de jinên Endamên Platforma Şahmaran a Mêrdînê xwestibûn tundiya li ser jinê şermezar bikin û ji bo vê destûra fermî jî hatibû girtin. Endamên platformê li dijî hemû astengiyan li Parka Karayollari hatibûn li gel hev û bi daxuyaniyekê tundiya li ser jinê şermezar kirin. Serdozgeriya Komarê ya Mêrdînê ji ber daxuyanî xwendin û çalakiya rûniştinê pêk anîn di der barê endama platformê Eylem Ergun de li ser daxwaza qeymeqamê Artukluyê bi hinceta 'propagandaya rêxistinê kiriye, dewleta tirk û neteweya wê biçûk xistiye' lêpirsîn dabû destpêkirin.

Piştî ku der barê Ergun de lêpirsîn hat vekirin der barê 12 kesên din ku tev li daxuyaniyê bûne de jî lêpirsîn hat vekirin. Ji van kesên ku der barê wan de lêpirsîn hat destpêkirin yek jî endama platformê û hevseroka HDP'ê ya Mêrdînê Eylem Amak e. Amak der barê mijarê de axivî.

**Dê li dijî êrîşan bisekinin**

Amak anî ziman ku ew lêpirsîna di çarçoveya çalakiyên 25'ê Mijdarê de li wan hatiye vekirin şermezar dikin û wiha got: "Lêpirsîna ku ji ber çalakiyên di çarçoveya 25'ê Mijdarê de li me hatiye vekirin wekî tundiya li dijî jinê dibînin. Me bi çalakiyên xwe xwest ku êrîşên li dijî jinê tên kirin bên sekinandin. Lê îro îktîdarê ji ber ku me azadî xwestiye û me mafê xwe parastiye der barê me de lêpirsîn vekiriye. Ji ber ku jin îro rastiyan diparêze û doza mafên xwe dike, ji her hêlê ve êrîş li dijî jinê tê kirin. Ev lêpirsîna ku der barê me de hatiye vekirin jî êrîşek e. Em ê wek Platforma Jinan a Şahmaranê her tim li dijî van êrîşên ku li dijî jinan tên kirin bisekinin." *MÊRDÎN*

## Jinên Reqqayê ji bo parastina bajarê xwe dixebitin

Piştî rizgarkirina bajarê Reqqayê ji hêla HSD'ê ve, ji zêdetirî salekê ve jiyana asayî li bajar vegeriya. Ji aliyê xwe jinan dest bi birêxstinkirina xwe kir û rola xwe ya pêşeng di civakê de lîst. Niha jinên Reqqayê cihê xwe di rêveberiyan de digirin û roleke girîng di parastina bajar de ji her xetereyekê dilîzin û mafên jinan diparêzin.



Hêzên Ewlekariya Hundirîn piştî 15 rojan ji rizgarkirina Reqqayê hate avakirin û jin jî tev li nav refên hêzê bûn. Lê ji ber binpêkirinên çeteyên DAIŞ'ê di dirêjahiya 4 salan de, di destpêkê de rêjeya tevlêbûna jinan gelek kêm bû. Piştî salekê hejmara endamên jin ên Hêzên Ewlekariya Hundirîn bû 260.

**Tirsa hatibû çandin şikandin**

Têkildarî mijarê endamên ewlekariyê got ku ew parastina bajarê xwe dikin.

Rîm Elî diyar kir ku jinên Reqqayê piştî rizgarkirinê dest bi lîstina rola xwe ya pêşeng di hemû warên jiyanê de kirine û benda tirsê ya ku çeteyên DAIŞ'ê di dilê wan de çandibû, şikandine.

Endama hêzê Buşra Umer Burcis destnîşan kir ku ew bajarê ku bi saya xwîna şehîdan bi taybetî şervanên jin ên YPJ'ê rizgar bûye, diparêzin.

**Xebateke koordîneyî heye**

Rêvebira Beşa Lêpirsîna Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn Menal Umer got ku hêzên hundirîn ji bo xizmeta şêniyan bi koordîneya ewlekariya giştî re xebatên parastinê bi rê ve dibin û dewriyeyan bi rêxistin dikin.

Her wiha Kîfa Mehmûd jî tekez kir ku wan di destpêkê de ji ber zîhniyeta baviksalar pirsgirêk dijiyan lê piştî derbasbûna zêdetirî salekê di ser rizgarkirina bajar re, ev tişt derbas kirine. *REQQA*

## Di şaredariya Ehrezê de rengê jinan

Berî ku Şehba ji çeteyan bê rizgarkirin jin bi êrîşên cur ber cur rû bi rû diman û ji mafên xwe yên herî rewa bêpar dihatin hiştin. Lê piştî ku Şehba ji çeteyan hat rizgarkirin şûnde jinan di her qadê de bi awayekî çalak cihên xwe girtin. Yek ji qadên ku jin bi awayekî çalak lê xebatê dimeşînin şaredarî ye.


Têkildarî mijarê hevseroka Şaredariya Navçeya Ehrezê ya Şehbayê Sîham Elî Elom axivî û diyar kir ku niha li şaredariyê jin li her qadê cihê xwe digirin û di qada hevserokatiyê de jî rola xwe dilîzin û wiha got: "Berê jinan nikaribû mafên xwe bi dest bixistana lê niha jin bi awayekî çalak di her qadê xwe xwedî rolek taybet e."

**Jin xwe azad îfade dikin**

Elom da zanîn ku jinên li Şehbayê ji ber dem ji bo azadiya xwe li ber xwe dane û wiha domand: "Jinên li Şehbayê ji ber çeteyan gelek tundî û zehmetî dîtin. Lê niha ev rewş guhert. Jin êdî dikarin bi awayekî azad xwe îfade bikin. Jin niha di şaredariyê de jî dixebitin û rola xwe dilîzin."

**Qirêjiyên çeteyan paqij dikin**

Her wiha Elom destnîşan kir ku ew ji bo xizmeta gel çi ji destên wan tê dikin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Şaredarî ji bo gel xizmetê dike. Em hewl didin ku tu kêmasiya gel nemîne. Rêyên ku çeteyan xera kiribûn me çêkirin. Ji bo pêdiviyên gel ên zivistanê jî em dixebitin. Di heman demê de ji bo hişmendiya jinê û hişmendiya civakê bi pêş bikeve me gelek xebat kirin û hîn ev xebat didomin. Ji bo civakeke azad û pêşketî em ê her di xizmeta gel de bin." *ŞEHBA*



## Namzetên jin ên keyatiyê ji xwe bawer in

Partiyên siyasî ji bo hilbijartinên 31'ê adara 2019'an ji bo bernamzetiyan bê navber xebatan dikin. Li Wanê jî ji bo namzetiya keyatiyê jin ketin nav tevgerê. Ayten Işik a ji taxa Serhat a Îpekyolu bû namzet diyar kir ku keyatî di nav civakê de wek pîşeya mêr tê dîtin lê hedefa wê ya ewil ew e ku nîşanî civakê bide jin jî dikarin bibin keya.

Işik da zanîn ku ew ê ji bo peydakirina hewcedariya jinan çi ji destê wê bê bikin û wiha got: "Ez ê kolanê bi rengê jinê bixemilînim û nîşan bidim ku tax çawa tê birêvebirin."

Namzeta taxa Yenîmahale Umran Kurt jî ev tişt anî ziman: "Ji bo li dijî zîhniyeta feodal a mêr gotina jinan hebe ez bûm namzet. Dema pirsgirêka jinan hebe, nikarin derdê xwe ji keyayên mêr re vebêjin. Piranî mêr pirsgirêkên taxan dibin ji keyayan re. Lê dema em dinihêrin en herî zêde li taxê demê derbas dikin jin in.Wê demê çima jin nebin keya? Em jî di rêveberiyên herêmî de hene. Gotina me jî heye û hêza me ya em pêk bînin jî heye." *WAN*

## 'Em ê kevneşopiya xwe her zindî bikin'

Jinên êzidî yên Efrînê ku li kantona Şehbayê bi cih bûne, bi zehmetiyên mezin hewl didin ku li ser pêyan bimînin. Jinên êzidî anîn ziman ku ew her tim ji ber baweriya xwe bi tundî û êrîşan re rû bi rû mane û wiha gotin: "Em ji çand, kevneşopî û baweriya xwe hez




dikin. Em li Şehbayê jî tevî zehmetiyên koçberiyê kevneşopiya xwe diparêzin."

Fatme Ehmed Mamo da zanîn ku çiqas dewleta tirk êrîşa wan kir jî wan bejna xwe netewandine û wiha got:"Dema dewleta tirk êrîşî Efrînê kir di heman demê de cihên olî yên êzidiyan û cihên dîrokî hilweşandin. Lê bila Erdogan baş bizanibe ku em ê tu carî bejna xwe li ber wî netewînin."

**Ola xwe li Şehbayê azad dijîn**

Her wiha Mamosteya Olê ya Êzidiyan Meryem Cindo jî ev tişt anî ziman: "Em li Şehbayê ola xwe bi awayekî azad dikarin bijîn. Em ji çand, kevneşopî û baweriya xwe hez dikin û tevî zehmetiyên koçberiyê kevneşopiya xwe diparêzin. Her wiha em di wê hêviyê de ne ku dê rojek Efrîn rizgar bibe û em ê vegerin ser axa xwe." *ŞEHBA*



www.arsivakurd.org



CÛMALÎ DOGAN

# Hesabpirsîna qetlîama Gurgumê

Em dikevin salevegereke din a nû ya qetlîama Gurgumê. Wek her salvegerê îsal jî dê kesên ku di qetlîamê de jiyana xwe ji dest dane bên bibîranîn û kirayarên qetlîmê werin naletkirin. Bi vê yekê ev qetlîama ku di dîroka Kurdistanê de nayê jibîrkirin; careke din dê di bîr û hişan de zîndî bibe û ev yek jî dê were wateya vîn û helwestek da ku êdî qetlîam û qirkirin pêk neyên. .

Bi vî awayî çend roj berê wek salvegera 40'emîn a damezirandina PKK'ê her wiha di rojên pêş de salvegera 40'emîn a qetlîama Gurgumê em ê li pey xwe bihêlin. Ev rastî di heman demê de ji bo fêhmkirina têkiliya di navbera damezirandina PKK'ê û qetlîama Gurgumê de jî nîşane û diyardeyeke girîng e. Ji ber ku li vêderê ji aliyekî ve, gelê Kurdistanê bi damezirandina PKK'ê re ber bi azadiyê ve gaveke bi hêz û dîrokî diavêje li aliyê din jî bi rastiya qetlîama dewleta TC'ê ya qirker û mêtinger er rû bi rû dimîne.

Li aliyekî azadî li aliyê din jî pêkanîna qirkirinê ya dewleta TC'ê ya mêtinger hemwext hatine jiyîn lê di heman demê de jî du rastiyên cuda penase dikin. Di vê wateyê de azadî û qetlîam di dîroka Kurdistanê de du kiryarên cuda yên li dijî hevdu ne ku her tim di dîrokê de cihê xwe giritine. Azadî; bi girêdana xwe ya bi binyada civakê re ku bi ziman, bawerî û nasnameya xwe israra jiyan û vînê, kiryarên dewletê jî sûcên mirovahiyê û êrişên qirkirinê temsîl dikin. Piştî damezirandina PKK'ê, pêkanîna qetlîama Gurgumê nîşaneya vê rastiyê ya şênber e.

Bêguman divê ji vir encameke weke 'ger ku PKK nehatibûya damezirandin dê Komkujiya Gurgumê pêk nehatibûya' neyê derxistin. Ger ku biryara damezirandina PKK'ê nehatibûya dayîn jî dê dewleta mêtinger û qirker a TC'ê Komkujiya Gurgumê pêk bianiya. Di vê çarçoveyê de jî ketibû nav liv û tevgerê. Plana vê komkujiyê, beriya hingê hatibû çêkirin. Ji xwe armanca biryara damezirandina PKK'ê jî ew bû ku li dijî van komkujiyan, gel bê amadekirin ku bikare xwe biparêze. Di mercên wê demê de xweparastina gel a li hemberî komkujiyan, nîşan da ku biryara damezirandina PKK'ê biryareke di cih de bû û rast bû. Li hemberî êrişên qirkirinê, damezirandina PKK'ê ji bo gelê Kurdistanê bû misogerî. Di vê çarçoveyê de, rastiya gelê birêxistinkirî ku li hemberî her cure êrişan gihîşt asta xwe bi xwe parastinê, careke din nîşan da ku dikare xwe biparêze.

Gelê Kurdistanê, di nav 40 salên dawî de di pêşengiya PKK'ê de li dijî dewleta mêtinger û qirker a TC'ê li ber xwe da û hebûna xwe parast. Her wiha bû xwediyê têkoşîna azadiya xwe jî. Tevî berdêlên pir giran jî karî ku vê yekê pêk bîne. Di van rojên ku em 40'emîn salvegera Komkujiya Gurgumê li pey xwe dihêlin de jî van erk û berpirsyariyên xwe pêk tîne.

Mîna 40 sal berê, dewleta mêtinger û qirker a TC'ê niha jî dev ji armanca xwe ya tunekirina gelê kurd û windakirina wan di îrokê de, bernedaye. Ji bo pêkanîna vê armanca xwe jî niha êrişên ji komkujiyên din hîn mezintir pêk tîne. Van êrişên xwe jî tenê bi bakurê Kurdistanê re sînordar nake, hema hema li dijî her çar parçeyên Kurdistanê êrîşan pêk tîne. Li Rojava, Başûr, Şengal û li welatên weke Fransa, Rûsya û hwd. ên ku kurd lê dijîn jî heman êrîşan pêk tîne. Gelek mînakên vê jî hene. Tevî ku hemû derfetên xwe yên madî û teknîkî bi kar tînin û tevî hemû alîkariya ku ji hêzên emperyal ên ku xulamtiya wan dike, nikare armanca xwe pêk bîne. Li pêşiya pêkanîna armancên xwe yên qirêj û qirker, hebûna PKK'ê weke astengiya herî mezin dibîne. Bi vê sedemê ye ku mîna 40 sal berê li Gurgumê, niha jî bi boneya ku êrişên xwe yên ji bo qirkirina gelê Kurdistanê bi ser bixe, bi hemû hêza xwe û desteka hêzên navdewletî, êrîşî PKK'ê dike.

Li ser Komkujiya Gurgumê vaye 40 sal derbas dibin. Ji wê rojê heta niha gelek tişt guherîn. Lê dewleta mêtinger û qirker a TC'ê ji karektera xwe ya faşîst tiştek winda nekir. Heta ku em dikarin bibêjin ev taybentmendiyên xwe yên bingehîn, hîn bêhtir qaîmtir kirin û li ser komkujiyên xwe, hin komkujiyên din jî zêde kirin. Li hemberî vê yekê ne tenê kurdên elewî yên li Gurgumê, temamiya Kurdistanê ji Komkujiya Gurgumê encam derxistin. Di serî de jî gelê Kurdistanê fêm kir ku divê xwedî partiyeke pêşeng a weke PKK'ê be. Fêm kir ku ji bo xweparastina li hemberî êrişên dewleta tirk a ku di karektera xwe ya qirker, mêtinger û faşîst de israr dike, neçarin ku bibin xwedî hêzeke bi rêk û pêk ku bikarin xwe biparêzin. Gelê Kurdistanê fêm kir ku bi vê yekê re dikarin hebûna xwe biparêze û azad bibe.

Niha jî ev tişt yek bi yek veguherîne rastiyê. Gelê Kurdistanê êdî bi pêşengiya PKK'ê bû hêzeke wisa ku bikare xwe biparêze. Bi rastiya xwe ya gelê ku di têkoşîna vejînê de hebûna xwe parast re, niha ji her demê bêhtir nêzî azadiya xwe bûye. 40'emîn salvegera Komkujiya Gurgumê bi rastiyeke wiha re pêşwazî dike. Hesabpirsîna ji kujerên di serî de Gurgum, hemû kesên di komkujiyan de hatine qetilkirin û girêdana bi bîranînên wan re, weke erkekê qebûl dike.

## Li gelek deveran grevên birçîbûnê didomin



Çalakiya greva birçîbûnê ya parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ku li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, ket roja 38'an. Piştgiriyên ku ji bo Guven û şikandina tecrîdê jî ji seranserê Kurdistanê heta bajarên Ewropayê jî didomin.

Di çarçoveya van çalakiyan de endamên Rêxistina Jinên Azad ên Kurdistanê (RJAK) li navçeya Ranya ya girêdayî Silêmaniyê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Bi heman armacî Komeleya Karkerên Mezopotamayayê ku li bajarê Silêmaniyê jî ji bo sê rojan dest bi grevê kir.

Li aliyê din çalakiya ku li Hewlêrê hatibû destpêkirin jî didome. Bi boneya piştgiriya bi çalakgeran re komeke çalakvanên Hewlerê jî tev li çalakiyê bûn.

Kurdistaniyên li bajarê Rennes ê Fransayê jî ji bo şermezarkirina tecrîdê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin.

Her wiha çalakiya li Berlîna Almanyayê dest pê kiriye jî ket roja 9'an.

Di heman demê de çalakiyên greva birçîbûnê ku li bajarên Rojava û bakurê Sûriyeyê hatine destpêkirin didomin. *AMED*

## 'Em dev ji axa xwe bernadin'

Şêniyên navçeya Amûdê ya girêdayî Kantona Qamişloyê li dijî gefên dargirkirina dewleta tirk a li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê daketin qadan û dewleta tirk şermezar kirin. Şêniyên Amûdê di diyar kirin ku dê gavekê jî paşde neavêjin û gotin ku dê heta nefesa xwe ya dawîn ji bo axa xwe li ber xwe bidin.

Ji aliyê din ve bertekên li dijî gefên Erdogan didomin. Di çarçoveya van bertekan de Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) derbarê mijarê de daxuyaniyeke nivîskî weşand û da zanîn ku li idjî vê divê kurd bi berpirsyariya neteweyî rabin.

Navenda Têkiliyên Dîplomasiyê ya TEV-DEM'ê jî bi daxuyaniyekê bang li gelên Sûriyeyê û raya giştî ya cîhanê kir ku li hemberî êrîşan xwedî helwest bin û dakevin kolanan. *QAMIŞLO*



# Li dijî êrîşan roj roja yekitiyê ye

Çar welatiyên ku di encama bombebarana balafirên şer ên artêşa tirk a li dijî wargeha Mexmûrê jiyana xwe ji dest dan bi girseyî hatin oxirkirin. Piştî êrîşa dewleta tirk sazî û partiyên kurd banga kirin ku roj roj yektiyê ye



Bi hezaran welatiyên Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ji bo merasîma oxirkirina cenazeyên 4 jinên ku di bombebarana artêşa tirk de hatibûn qetilkirin, li ber avahiya Navenda Çanda Mexmûrê kom bûn. Gel beriya spartina cenazeyan ber bi nûnertiya Neteweyên Yekbûyî (NY) ve meşiya. Piştî ku welatî gihîştin ber deriyê nûnertiya NY'ê, li ser navê Meclisa Gel a Mexmûrê daxuyaniyek hat dayîn.

Daxuyanî ji hêla hevseroka Meclisa Gel a Mexmûrê Fîliz Budak ve hat xwendin. Di daxuyaniyê de Budak di serî de êrîşa dewleta tirk, hemû hêzên ku li hemberî êrîşên bêdeng man û hevkarên êrişkaran şermezar kir û hat gotin ku gelê wargehê heta niha bi dehan caran rastî êrîşên dewleta tirk û hevkarên wê hatiye û ev tişt hat parvekirin: "Ji ber van êrîşan, gelê wargehê ji neçarî 8 wargeh guhertin. Gelê wargehê bi erêkirina Iraqê û NY'ê li vir bi cih bû. Lê di nava du salan de rastî du êrîşên hewayî yên dewleta tirk hat. Tevî ku wargeh di bin berpirsyariya NY'ê de jî, hêzên berpirsyar dengê xwe nekirin."

**Hevkariya qirêj û planên veşarî**

Budak daxuyand ku êrîş tenê bi destê dewleta tirk pêk nehatiye û wiha pê de çû: "Ev êrîş di asta navneteweyî de pêk hatiye. Girankirina tecrîda li ser Rêbertiya me, biryara der barê her sê pêşengên şoreşa me û ev êrîş, berdewamiya komploya navneteweyî ne. Ev êrîş di encama tawîzdayîna hêzên ku hesabên wan li ser rojavayê Kurdistanê hene de pêk hatin. Kengî pergala Rojava bê nîqaşkirin, dewleta tirk tengav dibe û êrîşî cihên din dike. Dema ku mijar dibe kurd û Kurdistan jî hemû cîhan dibêje; 'Min nedîtiye, ne bihîstiye û ez tiştekî nizanim.' Ev jî nîşaneya hesabên qirêj û veşarî ye."

Her wiha di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku dê heta dawiyê rûmeta xwe biparêzin û nebin hevkarê hêzên dagirker û daxuyanî wiha bi dawî bû: "Seferberiya niha li Rojava hatiye destpêkirin, em silav dikin û bang li tevahiya gelê kurd ê li welat û derveyî welat dikin ku ji bo hebûn û nirxên xwe, ji bo biserxistina xeta mirovahiyê dakevin qadan û bi dirûşma 'Em tecrîdê bişikînin, faşîzmê hilweşînin, Kurdistanê azad bikin' tev li seferberiyê bibin." *MEXMÛR*



## Kesên hatin qetilkirin bi girseyî hatin oxirkirin

**Cenazeyên çar jinên bi navê Asya Elî Muhammed (73), Narinc Ferman Qasim (26), Evîn Kawa Mehmud (14) û Eylem Muhammed Emer (23) ku di encama bombebarana balafirên şer ên dewleta tirk de jiyana xwe ji dest dan, bi tevlêbûna bi hezaran welatiyên ji wargehê, hatin oxirkirin.**

**Piştî merasimeke bi heybet a li Navenda Çand û Hûnerê ya Mexmûrê, gelê wargehê darbestên welatiyên ku hatin qetilkirin hildan ser û ber bi goristanê ve meşiyan.**

**Di meşê de welatiyan bênavber dirûşmên 'Şehîd Namirin', 'Bijî Serok Apo' û 'Qatil Erdogan' û 'Bimre Îxanet' berz kirin. Di axaftinên merasîmê de nûnerên partiyan banga yekitiya neteweyî ya kurd kirin. Her wiha piştî axaftinan cenazeyên welatiyan bi dirûşmên 'Şehîd namirin' oxir kirin. *MEXMÛR***

## Kurdistaniyan êrîşa dewleta tirk şermezar kir

Gelek sazî û rêxistinên kurd bi daxuyaniyên cur bi cur êrîşa li dijî kampa Mexmûr û Şengalê şermezar kirin.

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) têkildarî êrîşê daxuyanî da û diyar kir ku dê gelê kurd li dijî hemû êrîşan têkoşîna xwe ya azadiyê bidomîne. KCD bang li NY'ê û hemû saziyên neteweyî û navneteweyî kir ku li dijî êrîşên dewleta tirk helwestên xwe nîşan bidin.

**Roj roja yekitiyê ye**

Federasyona Demokratîk a Elewiyan (FEDA) jî li dijî êrîşan banga bilindkirina têkoşîn kir.

Ji aliyê di ve Civaka Îslamî ya Kurdistanê (CÎK) diyar kir ku li dijî êrîşan roj roja yekitiyê ye.

NAV-YEK û pêkhateyên wê; Sîwana Meclisa Jinên Êzîdî, Kordînasyona Gundên Êzîdiya li Bakurê Kurdistan, Meclisa Şengalê Derveyî Welat, Navenda Çanda Êzîdxan û Hevgirtina Ciwanên Êzîdî jî êrîşan şermezar kirin. Her wiha Koordînasyona Civaka Ezdixanê jî êrîşan şermezar kir û diyar kir ku dê li dijî hemû hesabên qirêj bi ruhê Mam Zekî Şengalê têkoşîna xwe bidomînin.


**Divê tu kes bêdeng nemîne**

Parlamenterê ji Koma YNK'ê li parlamentoya Herêma Kurdistanê Serko Azad Gelalî û parlamenterê Tevgera Goran ê li Parlamentoya Iraqê Kawa Mihemed jî xwestin hikûmeta Iraqê bi lezgînî nerazîbûn û helwest nîşan bide.

Hevserokên HDP'ê Pervîn Bûldan û Sezaî Temellî jî diyar kirin ku rejîma Erdogan bi 'bomberdûmanê' karê xwe yê ji bo hilbijartina xwecihî dike û ji raya giştî ya neteweyî û navneteweyî jî hate xwestin ku li hemberî vê yekê bêdeng nemînin.

**Li gelek bajaran çalakî**

Her wiha kurdistaniyên li gelek navend û bajarên Ewropayê jî daketin qadan û êrîş şermezar kirin. *AMED*



## Çalakvan çalakiyan xurt dikin

**PARÎS -** Hikûmeta Fransayê, êrîşa ku roja pêncşemê li bajarê Strasboûrgê pêk hat wek fersend nirxad û xwest ku çalakî bên rawestandin. Lê belê Êlekzeran guh neda vê bangê. Li ser tevna civakî bangên derketina kolanan tên kirin. Êlekzeran li ser tevna civakî peyama ku wê dev ji têkoşînê bernedin da. Li ser parvekirinên tevna civakî yên bi navê "Acte 5: Macron Îstîfa" deh hezar kesî diyar kir ku wê tev li çalakiya îro bibin.

# Tirkiye çeteyên DAIŞ'ê xwedî dike

Nûnerê Sûriyeyê yê Neteweyên Yekbûyî Beşar Caferî di civîna meclisa ewlehiyê de ku tê de dirêjkirina mekanîzmaya alîkariyên ber bi Sûriyeyê ve hate erêkirin, Tirkiye sûcdar kir. Caferî teqez kir ku Tirkiye korîdoran bi kar tîne da ku terorîst û cebilxaneyan derbasî Sûriyeyê bike

Meclisa Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) duh biryara ku alîkariya mirovî bi rêya sînor derbasî Sûriyeyê were kirin, erê kir. Di civînê de nûnerê Sûriyeyê yê NY`ê Beşar Caferî got hêzên navneteweyî alîkariyê nikarin bi rêya sînor bigihînin kesên hewcedar. Tê payîn ku alîkariya ji bo gelê penaber ê Sûriyeyê diçe nagihîje gel. Ji ber ku ev alîkarî weke alîkariya ji bo çeteyên DAIŞ û malbatên wan tên wergirtin. Ev alîkarî jî di ser sinorê Tirkiyeyê re tê derbaskirin.

Caferî diyar kir ku alîkarî di ser sînorê di navbera Tirkiyeyê û Sûriyeyê de ber bi herêmên "komên terorîst" ve belav dibin ku alîkariyan digirin û li çete û malbatên xwe tên belavkirin. Caferî got rêjîma Tirkiyeyê korîdorên li ser sînorê Sûriyê bi kar tîne da ku li şûna alîkariyan cebilxaneyê ji bo terorîstan derbas bike. Caferî wiha got: "Erebeyên ku qaşo yên alîkariyên mirovî ne, tu alîkarî tê de tune ye lê belê tije cebilxane ne."



Caferî wiha berdewam kir; "Ev cebilxaneyên ji çeteyan re tên şandin li dijî gelê me tên bikaranîn û qetil dikin. Pêwîst e her kes li hemberî vê yekê rabe û dewleta tirk hişyar bike. Dewleta tirk sûcê mirovahiyê dike ev nayê qabûlkirin. Em ê têkoşîna vê yekê li qada navneteweyî bidin."

Ji destpêka aloziya Sûriyê ve dewleta tirk a dagirker alîkariya komên çete bi hemû şêwazan dike. Her wiha dewleta tirk balafirgehên welatê xwe ji çeteyên ji hemû deverên cîhanê re vekir û derbaskirina wan ji Sûriyeyê û Iraqê re hêsan kir da ku tev li çeteyên DAIŞ û Cebhet El Nusrayê bibin. *ŞAM*



## Erdogan bi çekên Almanyayê sivîlan dikûje

Piştî gefên serokkomarê tirk Erdogan ê ji bo dagirkirina rojavayê Kurdistanê, balafirên şer ên tirk duh êvarê bombe li kampa penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) û Şengalê barandin.

Endama Partiya Çep a Meclisa Federal a Alman Ûlla Jelpke nerazîbûneke tund nîşanî van êrîş û gefên rejîma Erdogan ên li dijî kurdan da. Jelpke diyar kir, di demeke ku çeteyên DAIŞ'ê bi temamî hatine têkbirin, cihê gumanan e ku dewleta tirk dest bi dagirkeriyeke din dike û êrîşeke nû ya li dijî bakurê Sûriyeyê weke hewldana rizgarkirina DAIŞ'ê bi nav kir.

Berdevka Karên Hundir a Partiya Çep Jelpke her wiha diyar kir ku dagirkeriya artêşa tirk a li bakurê Sûriyeyê wê rê li ber koçberiyeke girseyî veke ku li wê herêmê gelek komên etnîkî û olî dimînin û bang li hikûmeta federal kir ku bikeve nav liv û tevgerê. Jelpke got, divê hikûmeta Merkel li pêşberî binpêkirina qanûnên navneteweyî bêdeng nemîne.

Jelpke wiha anî ziman, "Tirkiye endamekî NATO ye û çekên Almanyayê bi kar tîne. Ev yek berpirsyariya Almanyayê girantir dike." Jelpke diyar kir ku ji bo artêşa tirk bi çeteyên ji ber El Qaîdeyê mane nekeve nava şerekî nû, divê hikûmeta federal bikeve nava liv û tevgerê û got, "Divê em ji bîr nekin; şervanên YPG û YPJ'ê li dijî çeteyên DAIŞ'ê û El Qaîdeyê canê xwe feda kirin û kirin ku em li Ewropayê bi ewlehî bijîn." *BERLÎN*

# Li DYA'yê mirina bi çekan rekor şikand

Li gorî daneyên dawî, li DYA'yê sala bihurî nêzî 40 hezar kes bi çekan hatin kuştin. Lewma sala 2017'an wek sala herî bi xwîn û giran a 20 salên dawî hate dîtin.

Li gorî daneyên ku ji aliyê saziya bi navê CDC ve hatin weşandin, sala 2017'an 39 hezar û 773 kes bi çekan hatin kuştin. Li vî welatê ku gelheya xwe 320 milyon e, ev yek tê wê wateyê ku rojane 109 kes bi çekan hatine kuştin.

Li gorî daneyên CDC'ê, mirina bi çekan a par ji mirina di qezayên trafîkê de derbas kiriye ku sala derbasbûyî 37 hezar û 133 kes ji ber qezayên trafîkê mirin. Ji sala 1996'an û vir ve cara yekê ye ku hejmareke ewqasî zêde ya mirovan bi çekan tên kuştin.

Di nav vê hejmarê de herî kêm 14 hezar û 542 kes bi cînayetê hatin kuştin. Hejmara mirovên di şerê bi polîsan re û bi qezayê mirin jî gelekî zêde ye. Li gorî daneyên ku ji aliyê saziya Giffords Law Center to Prevent Gun Violence ve hate weşandin, piraniya kesên bûne qurbanê cînayetan, mêrên reşik in.

Li DYA'yê serê her 100 hezar kesî 12 kes bi çekê mirine. Ev rêje li gorî gelek welatên pêşketî qat bi qat zêde ye. Li Kanadayê serê 100 hezar kesî 2,1, li Almanyayê 0,9, li Brîtanya Mezin jî 0,3 ye.

Li DYA'yê, di dema Barack Obama de li ser şidandina qanûna wergirtina çekê hin gav hatin avêtin lê belê lobiya çekan a li vî welatî xurt e, ji ber vê yekê rabû. Serokê niha yê DYA'yê Donald Trump li dij e ku qanûna wergirtina çekan bê şidandin û zehmetkirin. *WASHÎNGTON*




## Bogdanov banga aramî û çareseriya aştiyane kir

Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Mihail Bogdanov, li ser plana êrîşa Tirkiyeyê ya rojhilatê Firatê banga arambûnê li aliyan kir û got, "Kurdên Sûriyeyê yên derve jî tê de em bi hemû aliyan re danûstandinê berdewam dikin. Bila her kes li hemberî van êrîşan raweste û ji bona gelê Sûriyeyê bi hestiyar be."

Bogdanov der barê serdana xwe ya Şamê wiha axivî: "Em guftûgoya xwe ya bi kurdên Sûriyeyê û yên derve jî di nav de, bi hemû aliyan re berdewam dikin. Em hemû aliyan vedixwînin arambûnê. Bila kesek li gorî dilê xwe û berjewendiyên xwe tevnegere ev tu sûdê nade hêzan û bila kesek li ser vê yekê pilana çêneke. Di dawiyê de, em difikirin ku guftûgo û metodên siyasî ji şer û pevçûn û wêrankariyê çêtir e." Her wiha destnîşan kir ku her tim aramî û aştî ji bo gelan û welatan baştir e.

Bogdanov herî dawî anî ziman bêyî ku li şer bê fikirîn û aloziya şer bê kûrkirin em dikarin bi rêyên aştiyê çareseriyan pêk bînin û destnîşan kir ku divê her kes di nav lêgerina aramî de be. *MOSKOV*



# Li Hindistanê 13 karker di madenê de asê man

Li madeneke derqanûnî ya li bakurê rojhilat ê Hindistanê, av ket kanê û ji ber vê yekê herî kêm 13 karker asê man.

Li eyaleta Meghalaya ku ji aliyê mîneralan ve dewlemend e, av li madeneke qaçax a li nêzî çem qewimî. Tê gotin ku tîmên alîkariya lezgîn dest bi derxistina avê ji kanê kirine. Polîsên xwecihî diyar kirin dema ku av li kanê qewimiye herî kêm 13 karker di hundirê kanê de bûn.

Dadgeheke li Hindistanê, ji ber gilî û gazincên hawirdorparêzan, sala 2014'an madenên komirê yên li herêmê qedexe kiribû, ji ber ku avê gemarî dikin. Lê belê şêniyên herêmê bi rengekî veşarî komirê derdixînin. Li cîhanê her roj karker tên qetilkirin û di karê zor û zehmet de têne xebitandin. Ev jî wek mafek ji bona karkeran tê dîtin û karker mecbûrî vî karî tên kirin. Li gorî vê yekê heqdestiya karkeran gelek caran nayê dayîn jî. *DELHIYA NÛ*




## Ji Amerîkayê daxuyaniya hevdîtina Dunford û Guler...

Sererkanê Artêşa Tirk Yaşar Guler û Sererkanê Artêşa Amerîkayê Joseph Dunford pêwendiyeke telefonî pêk anîn û hat gotin ku di pêwendiyê de li ser gefên êrîşên dewleta tirk hatine nîqaşkirin.

Li gorî daxuyaniya Berdevkê Sererkaniya Amerîkayê Patrick Ryder, herdu fermandar di pêwendiya telefonî de li ser metirsiyên Tirkiyyê yên ewlekariyê û danîna xalên çavdêriyê yên ser sînorê Sûriyeyê rawestiyane.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku Dunford ji hemkarê xwe yê tirk re gotiye, xalên çavdêriyê ji bo beralîkirina gefên li ser Tirkiyeyê hatine danîn û wiha hat gotin, "Dunford herwiha dubare kiriye ku Amerîka ji bo îstiqrara bakurê rojhilatê Sûriyeyê (rojavayê Kurdistanê) pabendî xebatên kordînasyona li gel Tirkiyeyê ye." *WASHÎNGTON*



www.arsivakurdu.org



## Wextê viraştişê tahîna Çele dest pêkerd

**COLEMÊRG -** Dewijê ke gelîyê Zapî yê Herêma Tîyarê yê Colemêrgî de cuyenî, kuncîyê ke aşma hezîrane de çinayî nika kenî tahîn. Dewijî kuncîyan kenî arêyo tarîxî yê dewa Rintkê û ewja de tahîne virazenî. Dewijî tewr zêde areyê dewê Biyadîr û Rintkî yê Çelê de tahîne virazenî. Ecevît Olmezo ke arêyê pî û kalikanê xo de xebetîyeno qisey kerd û va: "Ma hamnanan xele kenî arê û no wextan de zî tahîn virazenî. Tahînê tîna bi name û veng o. Par kîloyê tahîn 50 tl bî, la nika bîyo 60 tl."



# Vîşêrê têkoşînî ti rayîr çin o

Hemserekê Pêroyî yê KESKî Mehmet Bozgeyîkî derheqê mîtîngê KESKî de qisey kerd û va: "Ma weçînayîşê herêmî de kişta dormeyê asayîş, demokrasî û kede de ca gênî. Krîz tesîrê xo karker, feqîr, cinî û domanan ser de zî keno. Qayûmî tayînê şaredarîyan bîyî. Vîşêrê têkoşînî ti rayîr çin o."






Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) hemverê krîzê ekonomî ke tesîrê xo pêroyê komelî ser o kerdo de bi siloganê 'Hemverê feqîrî, betalî û nêseyyewbînanî de têkoşîn' mîtîngan virazeno. Hemserekê Pêroyî yê KESKî Mehmet Bozgeyîkî derheqê krîzê ekonomî, rewşa kedkaranê ke bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) kar ra ameyî eştiş, hedefê mîtîngan û weçînayîşê herêmî ke do 31ê adara 2019î de pê bêro de qisey kerd.

Bozgeyîkî qiseykerdişê xo de bale ant bi hezaran karkerê ke bi KHKyî ameyî îxraçkerdiş ser û wina va: "126 hezar kesê ke ameyî îxraçkerdiş ra 4 hezar û 237 kesî endamê KESKî yî û nizdîyê 2 hezar kesî hetê qayûman ra kar ra ameyî eştiş. Ma dest pêkeriş ra nata hemverê Rewşa Îstisnayî û KHKyan de têkoşîn danî. Seba ke ma tepîya agêrî karê xo ser ganî ma têkoşîn bidî. Mîtîngê êa yo ewil 17ê teşrîna peyêne de Îzmîrî de pê ame. Yê diyîn 9ê kanûne de Samsun de pê ame. Ma do mîtîngê xo yê hirên zî 15ê kanûne Edene û yê çarin zî Amed de pê bîyarî. Mîtîngê ma yê peyên zî do 22ê kanûne de bajarê Stenbolî de pê bêro. Ma nê mîtîngan de di waştişan qîrenî."

**Wa şar biherikîyo raşteyan**

Bozgeyîkî dewamê qiseykerdişê xo de va: "Krîzê ekonomî tena tesîrê xo kedkaran ser de nêkeno. Tesîrê xo karker, feqîr, cinî û domanan ser de zî keno. Bi seyan şîrketî top eştî. Deshezaran emrdimî bi erjanî yenî xebetnayîş. Cok ra ma û DÎSK, TMMOB û TTByî pîya Programê Têkoşînê Hemverê Krîzî amade kerdî. Mah eme cayan de tesîrê krîzî ser o qisey kenî û malumatan danî. Krîz netîceyê zîhnîyetê û îdarekerdişê antîdemokratîkî de vejîya raşte. Ma wazenê ke şar tewrê ma biherikîyo raşteyan."

**Qayûm tayînê şaredarîyan bîyî**

Bozgeyîkî qiseykerdişê xo yê peyênan de qala weçînayîşê herêmî ke do 31ê adara 2019î de pê bêro kerd û wina qedêna: "Weçînayîş seba kesê ke doza aştî û kede kenî zaf muhîm o. Ganî ma zî wayîrê vatişi bî. Di serranê peyênan de qayûm tayînê şaredarîyê şarî ameyî kerdiş û xebatkarî bi hawayo antîdemokratîkî kar ra ameyî vetiş. Tewrê dormeyê muxalîfî yê komelî xebatê ma estî. Ma weçînayîşê herêmî de do kişta dormeyê asayîş, demokrasî û kede de ca gênî. Ma seba weçînayîşî sempozyûmam pê bîyarî. Do hewteyo yewin yê aşma çele de vindetişê kedkaran aşkera bibo." *ÊLIH*

## Ma do 16ê kanûne de biherikî Amed

Seke yeno zanayene Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) seba ke faturaya krîzî ked kedkaran rê nêra birnayîş do 15ê kanûnê de Edene, 16ê kanûnê de Amed û 22ê kanûne de zî do Stenbol de mîtîngan pê bîyaro. Kedkarî seba mîtîngê Amedî baajrê Êlihî de xebetîyenî. Serekê Şûbeyê Egîtîm Senî yê Êlihî Necatî Dadak, Hemserekê Sendîkaya Kedkaranê Xizmetê Sosyal û Weşîye (SES) yê Êlihî Denîz Topkan û Sekreterê Pêroyî yê Sendîkaya Kedkaranê Bûroyî (BES) Azîz Ozkanî derheqê xebatan de qisey kerdî.


Qiseykerdişan de seba tewrbîyayîşê mîtîngan û reaksîyon nîşandayîşê krîzê ekonomî veng ame kerdiş û wina vajîya: "Ma Êlih de bi hawayo aktîf xebetîyenî. Ma do Êlihî ra bi hawayo girseyî şêrî mîtîngê Amed. Proseso ke krîz xorî beno de bêvengîya hemverê caardişan yeno mehneya ortaxî. Cok ra ganî ma têkoşîn bikerî û raşteyanê mîtîngî tederî. Waştişê ma yê yewin aştî yo. Dima ra ma wazenê ke faturaya krîzê ekonomî kedkaran rê nêra birnayîş."



# Avşîna yew serrî nîna dermankerdiş

Hulya Usanmaze qezaya Artuklu ya Mêrdînî de bi îdîaya 'endamîya rêxistine' ameyêne muhakemekeriş û 6 serr û 7 aşmî cezaya zindanî aye rê ameye birnayîş û erşawîya zindan. Usanmaza ke Hemserekîya Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Artuklu kerdêne wayîrê hirê domanan a. Usanmaze di hewte verê cû erşawîya zindanê Tîpa Eyî yê Mêrdînî û mecbur mende ke doman xo ya yew serrî Avşîna nêweşe zî tewrê xo biba zindan. Avşîne nêweşa giran a û binê çermê sereyê aye de tumur esta. Ganî Avşîne bêra dermankerdiş, şert û mercê zindanî de îmkanê dermankerdişî çin a.

Usanmaze 15 rojîyo ke tewrê kênaya xo zindan de ya û bi rayîrê avûkat û keyeyê xo mesajêk erşawit û seba kênaya xo vengê hîsgerîye daye. Usanmaze ard ziwan ke ê Avşîne 3 aşman ra reyêk seba dermankerdişî benê nêweşxaneyê Edene û tewr peynî di aşmî verê cû Avşîne berdî nêweşxane. Usanmaze dîyar kerde ke kênaya aye nika tena bi yew şurubêk yena dermankerdiş û do seba dermankerdişê kênaya xo waştişnameyêk binusa îdareyê zindanî. Usanmaze tewr peynî daye zanayene ke rewşa kênaya aye baş nîya û rîyê aye de masayîş vejîyayî raşte. *MÊRDÎN*






## Mudirê zindanî: Hîna 12ê êlule nêqedîyayo

Zîndananê Kurdistan û Tirkîya de roje çin a ke xeberê zext, neheqî, teda, îşkence, tehdit û sewbîna nêrî. Nê zindanan ra yew zî Zindanê Tîpa Tyî yê Duzce ke timî bi binpaykerdişê îxlalê heqan yeno rojeve yo. Hepsîyî bi rayîrê telefonî keyeyanê xo rê qala binpaykerdişê heqan kerdî dîyar kerdî ke mudirê zindanê înan tehdit kerdo.

Burhan Gîzlenmîşo ke bi rayîrê telefonî birayê xo Agît Gîzlenmîşî reyde qisey kerdo, dîyar kerd ke mudirê Zindanê Tîpa Tyî yê Duzce hepsîyan rê vato 'Hîna 12ê êlule nêqedîyayo' û heme hepsîyan tehdit kerdo. Burhan Gîzlenmîşo da zanayene ke birayê ci wina vato: "Wexto ke ma telefon nêkerd, bizanê ke tîya de reyna îşkence dest pêkerdo."

Eynî mudir verê cû zî hepsîyan rê vatbî 'Ma do gonîya şima birijnî. Şima do çong bironî' û kewtbî rojev. *AMED*

## Şêx û rîsipeyê eşîrê Reqqa



Îzehetê şêxê eşîrê Reqqa ke badê tehditanê serekkomarê Tirkîye Recep Tayyîp Erdoganî ke hêrişê Vakur û Rojhelatê Sûrîye bîyî, ameyî. Şêx Mihemed Tirkî El-Sewan ke şêxê eşîrê El-Sebxa yo û Şêx Ayid El-Hadî ke şêxê eşîrê El-Mûs El-Zahêrî yo qisey kerdî.

Tirkî El-Sewan qiseykerdişê xo de bêvengîya dinya rexne kerd û va: "Ganî dewletê dinya, sere de zî Koalîsyonê Mîyanneteweyî têgêrayîşê Erdoganî peynî bikerî û vindetişêko cîdî û fermî nîşanê îzehetê ci yê dişmenî ke hemverê Vakurê Sûrîye dabî, bidî. Ma îzehetê Erdoganî sey wehşîtî û teberê merdimîye vînenî. Tirkîye şarê Sûrîye tehdit kena. Hewl dana ke têmîyanî viraza û hêzê leşkerî û sivîlê herême vila bikera."

**Wa gonî nêra rijnayîş**

Şêx Ayid El-Hadî zî dîyar kerd ke ganî hukmatê Sûrîye seba pawitişê herra Sûrîye qeraran bigîro û va: "Ma nê hêrişan red kenî û sey binpaykerdişê herra Sûrîye vînenî. Pawitişê herra Sûrîye wezîfeyê welatperwerî yo. Ma terorîst nîyî. Ganî dewletê dinya yê bi şeref bi çimanê merdimîye biewnî hêrişanê serê Vakurê Sûrîye û rijnayîşê gonîya şarê Sûrîye vindernî." *REQQA*

## Tehqîqato dibarekerde ra 8 aşmî ceza girewt


Wayîrê Îmtîyazî yê Rojnameyê Sîlvan Mucadeleyî Ferhar Parlakî çarçeweya tehqîqatêko ke Serdozgerîya Komarî ya Farqînî dabî dest pêkerdiş de amebî tepiştiş û 10ê nîsana 2018î de amebî tewqîfkerdiş. Parlakî xebatê xo yê rojnamegerî ke prosesê qedexeyê tebervejîyayîşê 2015î de qezaya Farqînî ya Amedî de kerdî vera yeno sucdarkerdiş û 8 aşmî ra zêde yo ke tewqîfkerde yo. Avûkat Mehdî Ozdemîrî derheqê rewşe de qisey kerd.

Ozdemîrî qiseykerdişê xo de bale ant cezaya ke dîyaya Parlakî ser û wina va: "Şahidê ke kamîya înan dîyar û nêdîyara derheqê qedexeyê Farqînî de qisey kerdî. Yeno îdîakerdiş ke Parlakî cayo ke ameyo qedexekerdiş de fotograf anto û erşawito rêxistine. Şahidan mîyan de kesê ke derheqê înan de doze abîyî zî estî û dîyar kenî ke ê Parlakî nêşinasnenî. Îdîayan mîyan de 'rojnamegerê rêxistine yo' zî esto. Parlakî bêusûlîy qayûmê Farqînî kerdbî xeber û qayûm Parlakî gere kerd. Parlakî verê cû nê îdîayan û faalîyetê xo yê rojnamegerî ra beraet kerdbî. La Dozgerîya Farqînî reyna tehqîqat daye dest pêkerdişe. Yani muhakemekerdişêka dibare esta. Parlak 8 aşmîyo ke paweyê muhakemekerdişî yo." *AMED*



www.arsivakurdi.org

# Qêrîn û daxwazên Ahmet Kaya



Kakşar
OREMAR

Kaset û CD'ên Ahmet Kaya bi milyonan hatin firotin. Albûma 'Hoşçakalin Gozum' berhema xatirxwestina wî bû ji malbat, heval, dilxwaz û welatê wî bû. Ew çû lê deng û ramanên wî namirin

Li rex karê çêkirina albûmên xwe yên dewlemend, Ahmet Kaya di nav gel û dilxwazên hunera xwe de jî dest bi pêşkêşkirina konseran dike. Ji aliyê medyaya alîgir a sîstema Kemalîzmê ve, wî mîna "hunermendê bi tirs û xeternak" tê binavkirin. Ev karê wan dilê wî û guhdarên wî diêşîne, lê ew bi israr li ser karê xwe berdewam e.

Albûma Ahmet Kaya ya 6´emîn *'Başkaldiriyorum'* (Serî Hildidim) ku xebata Ahmet Kaya û Yusuf Hayaloglu ya hevpar e û bi demê re pir baş tê pêşwazîkirin. Çimkî welat hêdî hêdî di têkoşîna wê hindê de ye ku tarîtiya salên li pey 12'ê îlonê ji bîra xwe bibe.

Ahmet Kaya derdê xwe ji derd û elemên gel û axa ku ew tê de hatiye dinê cuda û dûr nabîne. Şerekî qirêj li welatê wî Kurdistanê tê meşandin û her roj xortên welatê wî li ser axa xwe tên şehîdkirin. Ji bo wê jî ew di albûma xwe ya bi navê *'Îyîmser Bîr Gul'* an jî *'Kod Adi Bahtiyar'* bersivê dide pêvajoyê. Keda û girnijînên wî jî kîneke mezin di dilê rasîstên tirk de diafirîne. Ne diwêrin li dijî wî bisekinin û ne jî dikarin dengê wî bifetisînin, lê weke koremarekî li benda derfetekê ne ku bi wî vedin.

Stranên ku gotina wan jê re hatine qedexekirin, di konseran de distirê û ji wan jî du albûman li jêr navê Resitaller 1 û 2 belav dike. Berhemên van du konseran bi bingeha xwe çavkaniya xwe ji çanda gel standibûn. Êdî albûma wî ya bi navê Resitaller 2 rekora firotinê di nav bazara muzîka Tirkiyeyê de, dişikîne.

Ahmet Kaya bi hevalê xwe Ahmet Koç re ku di hemû konser û berhemên wî de jê re li sazê dixe, dest bi çêkirina albûma xwe ya nû *'Sevgi Duvari'* (Dîwarê Evînê) dikin.

**Rikberiya li dijî Kemalîzmê**

Sîstema serdest ji huner û stranên Ahmet Kaya ne razî ye lê ew karê xwe didomîne û bi stranên xwe hemû çînên civaka Tirkiye û Kurdistanê vedixwîne serhildanê. Ji bo wê jî çiqas ku dem derbas dibe, serê wî dikeve nav derd û belayên ku parêzvanên sîstema Kemalîzmê jê re çêdikin. Çiqas ku ramanên wî mezin dibûn, pirsgirêkên mezin jî derdikevin pêşberî wî. Li gelek deveran konserên wî li jêr navê 'xeterebûnê' de, tên qedexekirin û albûmên wî jî tên komkirin û nahêlin ku gel ji xwe re bikire. Li ser vê pêvajo û rewşê jî stranan diafirîne û 11´emîn albûma xwe ya bi navê 'Başim Belada' (Serê min di belayê de ye) ku ji helbestên Ahmed Arîf, Attîla Îlhan û Yusuf Hayaloglu pêkhatibû, belav dike. Dîsa bi awayekî ku nayê bawerkirin, ew albûm jî ji aliyê gel ve pir bi germî hat pêşwazîkirin. Di vê albûmê de stranên xwe jî bi muzîkek dewlemend xemilandibûn.

Êdî di nava medyaya Tirkiyeyê de wêne û navê wî li her derê tê dîtin û bihîstin. Ew di tarîtiyek reş de serkêşê ramanên azadîxwaziyê ye. Gel bi çavekî bilind û kesên akademîsyen jî qedrekî bilind raberî wî didin.

Di 12´emîn albûma xwe ya bi navê 'Dokunma Yanarsin' (Dest Medê Tu yê Bişewitî) dîsa di jiyana xwe ya hunerî de, hinek guherandinên din çêdike. Rengê muzîkê û giraniya ku di cewherê helbestên Yusuf Hayaloglu de tê dîtin, dibine sedem ku zêdetir ji berê 12´emîn albûma wî ji aliyê gel ve bê pêşwazîkirin. Hevkariya wan bi germî didome û ev hevgirtin di jiyana hunerî ya Ahmet Kaya de, pêvajoyek nû dide destpêkirin. Di vê pêvajoya nû de êdî kaset û CD'ên Ahmet Kaya ji milyonekê zêdetir tên firotin. Êdî bûbû xwedî muzîk û hunera xwe ya taybetî û îmzeya wî jî di cîhana hunerê de bi bihayekî giran dihat dîtin.

Di 13´emîn albûma xwe ya li jêr navê 'Tedîrgîn' (Biqilqal) hem bi deng û hem jî bi rêya sûdwergirtina ji hemû pêşkeftinên teknîkê yên rojane, berhemeke herî hêja afirand ku di jiyana wî ya hunerî de dîsan jî pêngavek nû û bihêztir ji berhemên wî yê berê bû. Çimkî ew berhem bi muzîkek profesyonel û di firmayek herî baş de hatibû amadekirin.

Salên 1990'î di navbera kurdan û dewleta Tirkiyeyê de, şer berfirehtir dibe û zordariya li ser hêzên demokrat jî zêdetir dibe. Li Kurdistanê serhildanên siyasî-neteweyî dest pê dikin. Bi vê re ew hunera ku rêya azadiya ramanên siyasî vedikir, dîsa jî ket jêr zext û gefên alîgirên wê sîstema ku ew heftê sal bû her tim digotin: yek ziman, yek al, yek netew, yek al. Girtin û kuştina rewşenbîr, hunermend û azadîxwazan careke din mîna salên 1980'yan dest pê kir.

Li rex hemû dijayetiyên sîstemê lê dîsa jî li ser xebat û jiyana xwe ya hunerî mîna berê berdewam e.

Û albûma 'Şarkilarim Daglara' (Stranên Min Ji Çiyayan Re) tê amadekirin. Di vê albûmê de ku stran bi piranî ji helbest û muzîka wî bixwe pêkhatibûn, dîsa xanima wî Gulten Kaya jî bi stranekê ku dabû hevalê jiyana xwe, hevkariya wî dike. Strana *'Daglar'* (Çiya) bi naveroka xwe ya tije peyamên demê di nava gel de gelek baş hat pêşwazîkirin. Ew stran ji bo çiyayên Kurdistanê bû, çiyayên ku bibûn hêlîna gerîla û azadîxwazên rêya serxwebûna Kurdistanê. Qêrîn û daxwazên Ahmet Kaya bi leşkerî jî birêveberên sîstema serdest re digot ku hûn nikarin çiyayên me tune bikin û ew hêlîn û hebûna me ne.

Her wiha di vê albûma xwe de ji bo yekemîn car helbestvanê kurd (Orhan Kotan) jî nas dike û helbestên wî jî dike stran û dixwîne.

Albûma 14´an bersivek bû li dijî wî şerê ku li bakurê Kurdistanê di navbera kurdan û artêşa Tirkiyeyê de dihat meşandin. Ji bo wê jî albûm bi hejmarek gelek zêde hat firotin.

Di mercên wiha de, li bendê ye ku li Tirkiyeyê dewletek azad û demokrasiyek rastîn çêbibe. Ji ber wê jî bo gihîştina bi vê armancê, bi hêvî pêngavên xwe ber bi pêş ve diavêje. Ew dixwaze êdî wendabûna kesên azadîxwaz û şerê gemar bi dawî bibe.

15´emîn albûma Kaya *'Benî Bul'* (Min Bibîne) dibe sedem ku êdî hemû kesên azadîxwaz heqîqeta bîr û ramanên Kaya bi aşkerahî bibînin û bipejirînin. Tiraja wan kovar û rojnameyên ku wêne û hevpeyvînên Ahmet Kaya tê de cih girtine, diçe jor û ew di hemû Tirkiye û Kurdistanê de hunermendê herî populer e.

Navê wî weke hunermendekî şoreşger û aştîxwaz derbasî derveyî sinorên Tirkiyeyê bûye û li Îran, parên din yên Kurdistanê, Iraq û piraniya welatên erebî jî baş tê naskirin û guhdarkirin. Êdî bi deng û hunera xwe hêzeke mezin û xwedî bandor e.

Ew bi hevala xwe Gultenê re bi tîpên destpêka navên xwe, şirketek prodüksiyonê ya bi navê (GAK PRODUCTION), datînin. Deriyê wan ji bo herkesê ku bixwaze muzîk û hunerek rastîn biafirîne, vekiriye. Êdî navê wî di nava navên herî navdar de diyar e û ew di kanalek TV'ê ya bi navê 'Ulusal TV' de bernameyekê ya bi navê 'Ahmet Abînîn Vapuru' çêdike.

"GAK Production" tim di xizmeta hunera resen, protesto û xizmeta doza neteweyî de ye ku rêgezên demokrasiyê bi civakê dide nasandin.

Sala 1996'an 16´emîn albûma wî ya bi navê 'Yildizlar ve Yakamoz' jî li ser vê armancê çêbû.

**Xelata ku qedera wî guherand!**

Hunemend Ahmet Kaya ji bo girafîkên CD'ên xwe yên tije peyamên watedar û muzîka profesyonal, bi dehan caran ji aliyê saziyên hunerî-çandî ve tê xelatkirin.

Serkeftinek wiha ji bo 17´emîn albûma xwe ya bi navê 'Dosta Duşmana Karşi' (Li Hemberî Dost û Dijminan) jî bi dest anî. Ew ji aliyê 'Komeleya Rojnamevanên Magazînê' bi duristkirina şeva Stêrka Muzîkê ya Salê tê xelatkirin. Li wir dema ku xelata xwe distîne, di axaftina xwe de dide xuyakirin ku ew amadekariya albûmeke nû dike û repertuara wê jî di destê wan de amade ye. Di berhemê wî yê nû de bi zimanê kurdî jî stranan yê bixwîne û kilîpan jî yê çêbike. Ji ber ku ew bi koka xwe kurd e û zimanê wî yê zikmakî kurdî ye.

Lê di wê şevê de ew ji aliyê hinek şovenîstên tirk ve ket ber êrîşê û roja piştre jî ew heya çend rojan hat binçavkirin. Êdî her kesî di asta mafê mirov û rêbazên demokrasîheziyê de rûçikê xwe yê rastîn dabû diyarkirin. Hinek kurdên sernas jî bêdengî hilbijartibûn û nebûne hevkarên wê pêngava nû ya ku Ahmet Kaya li dijî înkarkirina ziman û hunera kurdî hilanîbû.

***Navê albûma wî ya nû 'Hoşçakalin Gozum'*** (Bi Xêr Bimînin Çavê Min) bû.

**Derketina ji Tirkiyeyê**

Dema ku wî zanî sîstema serdest jê nagere û dê tim bê girtin û zindanîkirin, ji rûyê neçariyê bo demeke kin diçe Ewropayê û li Fransayê bi cih dibe. Hinek jêder jî didin diyarkirin ku ew di bin gefên kuştinê de ji Tirkiyeyê reviya û nekarî vegere. Albûma 'Hoşçakalin Gozum' berhemê xatirxwestina wî bû ji malbat, heval, dilxwaz û welatê wî. Wî ev berhema xwe ya dawiyê, sipart hevala rojên xwe yên xweş û nexweş Gulten Kaya.

Dema ew jî mîna bi hezaran kurdên din diçe Ewropayê, bi germiyek bêmînak ji aliyê gelê kurd û dildarên jiyana wekhev ve tê pêşwazîkirin û hemwelatiyên wî li dorê kom bûn. Li mîtîngên mezin beşdar bû û silav da girtiyên azadiyê. Di MED TV'ê de konsera herî mezin da û bi hevpeyvînên berfireh li dijî rayedarên otorîter peyamên balkêş da gel.

Ahmet Kaya di 16'ê mijdara 2000'î de, dûr ji çaveraniya bi milyonan mirovan di xerîbiyê de jiyana xwe ji dest da. Heza ji kesayetî û rêbaza wî dîsa hingî baştir aşkera bû dema ku li goristana Parîsê hate veşartin. Bi dehhezaran kes xwe gihandin merasîma oxira wî ya dawiyê. Wî bi hezaran xwezî û hesret bi xwe re birin nav axa sar.

Piştî wê Gulten Kaya di xemgîniyek mezin de dest bi xebata mix editing-mastering ya albûma wî ya nû da kir. Stranên wî yên dawiyê di wê albûmê de bi cih bibûn. Armanca Gultenê ew bû ku bi dijminên demokrasî û aştiyê bide fêhmkirin ku Ahmet Kaya navekî nemir e.

Ahmet Kaya di jiyana xwe de gelek caran ji ber naveroka stran û helbestên xwe, hat girtin û zindanîkirin. Wî her tim wiha digot: "Li Tirkiyeyê îdareya Emniyet û Mehkema Dewletê ya Asayîşê mala min a duyê û nav û nîşanên min a duyemîn in."

Berevajî hemû dijberî û zextên ku ji aliyê sîstema Kemalîzmê ve li dijî bîr û ramanên wî dihatin kirin, albûma dawî û xatirxwestina wî, di sala 2001î de ji aliyê Gulten Kaya û di GAM MUZÎK'ê de gihîşt destê guhdarên deng û hunera wî.

Di wextê ku li derveyî Tirkiyeyê bû, ji ber wan konser û axaftinên xwe gelek caran bi sûcên mîna 'Xayinê Welat', 'Hevkarê xayin û terorîstan' hat tawanbarkirin û jê re gelek doz hatin vekirin. Di yek ji wan dozan de ew bi 3 sal û 9 mehan girtinê hat mehkûmkirin. Ev qirar ji aliyê mehkema bilind û berpirsyarên dadgeha Tirkiyêyê ve hatibû dayîn.

Lê êdî ew di nav gelê xwe de nemabû û li rex rewşenbîr, siyasetvan û kesayetiyên herî bi nav û dengên cîhanê li goristana Parisê 'Pere-Lachaise' bibû mêvanê Dr. Qasimlo, Dr. Sadiq Şerefkendî, Yilmaz Güney û hemû parazvanên bîr û hizrên azadiyê.

Ew çû, lê deng û ramanên wî namirin. Ahmet Kaya bû sembolek ji sembolên azadîxwazên Kurdistan û hemû gelên bê welat.

Dema li Ewropayê bû her tim wiha digot: ***"Ji vir û şûnde ez ê stranên xwe yên herî xweş ji gelê xwe re bixwînim."*** Ew dilşikestî û pir bi hesret bû. Li rojên xwe yên bihûrî poşman bibû. Ji bo wê jî her tim wiha digot: ***"Ez dereng bi xwe hesiyam, lê belê êdî ez ê heya mirinê ji gelê xwe re bistrêm û li rex wan bimînim."***

Ahmet Kaya hunermend bû û mîna her hunermendekî rastîn biçekî marjînal bû.

Ew gelek salan di şerê "erê-nayê " de bû. Kurdan şerê doza xwe ya rewa giran kiribû. Ew jî mîna keştiyeke biçûk, geh bi ber pêlên kurdayetiyê, geh ber bi çepgirtiyê diket û bi vir û wê de diçû. Di bin bandora çepgirtiyê de bû. Ji feqîriyê, ji tunebûnê, ji birçîbûnê hatibû. Bi dengê xwe, bi keda xwe gihîştibû hunermendî, navdarî û dewlemendiyê. Kurdbûn xeternak bû, lê êdî wî xwe dinasî. Ji serhildanê, berxwedan û ji peyvên mezin hez dikir. Çepgirî ji kurdbûnê hêsantir û kêm xetertir bû. Wî her tim digot: "Ez ne nijadperest im, ez enternasyonalîst im."

Dereng be jî bi alîkariya jina xwe Gulten a Dêrsimî gihîşt rastiya gelê xwe. Gava di wê şevê de got: "Ez dixwazim straneke bi kurdî bibêjim û klîba stranê bi kurdî bikşînim" kevçiyên ku dostên wî avêtin serê wî, jê re bûn şok. Welat terikand. Li Ewropayê kurd lê xwedî derketin, germahiya kurdan û eşqa welatparêziyê ew kemiland û ew vegeriyabû nava konê bav û kalên xwe. Konê ku bi hemû koşkên zêrîn nedihatin hûnandin.

Ew jî mîna Yilmaz Guney, di dema xwe ya herî bi ber de û di emrê Yilmaz de, ji nav me bar kir. Ew ji pişta me çû. Gultenê di roja merasîma veşartina wî de bi dengekî bilind wiha got: "Heta li welatê te ziman û muzîka te azad nebe, ez termê te nabim welat."

***Têbînî:*** Min tenê du caran nemir Ahmed Kaya li Medya TV dît. Ez û ew hinekî li ser jiyana wî axivîn. Min xwest ez hevpeyvînekê pê re çêbikim, lê wî digot: ***"Ez xwe hînî zimanê kurdî dikim û dixwazim bi zimanê xwe yê zikmakî bi te re hevpeyvînê çêkim. Hinek dem bide min..."***

Min ev nivîs ji rûyê wan notan nivîsî ku di wan du rûniştinan de hilanîbûn. Her wiha bi rêya telefonê jî min çend pirs ji xanima wî Gulten Kaya kirin ku nivîsa min dewlemendtir kir.

Qêrînên Ahmet Kaya yên bilind hê jî ji bîra dîrokê neçûne û ew hesretên bêdawî dê rojekê bibin rastiyên jiyanê. Ew hingî dê ji bîra "wijdanên nerazayî" biçe ku jiyan jî gihabe rawestgeha xwe ya dawiyê.

